NAWISK

KENGÎ GEREKE PIRTÛK DUBARE BÊTE ÇAPKIRIN?

Tehsîn Navişkî

Ji sedemên kêmiya rêjeya xwendevan û havlê ya êksera pirraniya saziyên çap û weşanan li herêma Kurdistan a azad kirî, bi part û guropên hikumdar û nekumdar ve, pirtûkên nivîseran, piraniya caran, li pey havliyên kesokî û niyasiyê, dihên çapkirin û weşandin.

Xwendevanê herêmê, di vê pirosesa neasayî de, hinek caran wê bibîne, pirtûkek dubare, hember dîtina nivîserên hijmareka reşnivîsên; hêşta ronahiya çapê nedîtîn hate çapkirin. Pirsyara li vê derê, xwe disepîne: Kengî gereke pirtûk dubare were çapkirinş Bi nêrrîna min, bersiv aşkere ye. Li wî çaxî pirtûk, gereke dubare were çapkirin, çaxê xwendevanê wê, ji hejmara danên çapkirî û weşandîn zêdetir lêhat û daxwaziya wê li bazarê hatekirin. Hîngê li pey sîstemê nîşandan û daxwazî mafê destgayên weşandinê heye, dubare û wê pirtûkê çap bike. Dîsan demê pirtûkek girink havlî bi mêjû û keltorê neteweyî ve be û ji mêje bi çapeka kevin hatibe çapkirin û li bazarê tine be, hîngê dê bibe karekê ji hejî, çaxê ji layê nîştiman-perweran ve destpêşxerî dehê kirin û wan cûn e pirtûkan çap dikin.

Lê mixabin pirosesa dubareçapkirina pirtûkan, îro li Herêma Kurdistana azadkirî, pirraniya wan berevajî xalên li serî me dest nîşankirîn ne. Xwendevan wê bibîne, rêjeya pitir ji wan pirtûkên dubare dihêne çapkirin û dikevine bazarê, yan ji pirtûkên rewşenbîrî û şairên me yên kilasîk in ku pitir ji carekê hatîne çapkirin, yan yên nivîserekê qelem rawestiya ye ku rolekê karîger di destgeyekê weşandinê de heye, dê hevalên desteka sengandina pirtûkan êxite kirasê şermê û dubare pirtûka xwe ya pirraniya wê bi diyarî pêşkêşkirî dite çapkirin û dubare êxite bazarî. Yan nivîserekê din wê were, pirtûkek kilasîk dubare berhev dike û tiştekê li formê wê zêde dike yan ne, bi bihaneya pîroziya kilasîkîzmê wê çap bike û li bazarê bi rex yên din ve bike meydana texên tozê. Bi nêrrîna min, reftara vê çap û weşandina niho li herêmê berbelav bandorek erênî li ser rewşenbîrî ya herêmê bi taybetî û Kurdistana mezin bi giştî heye.

Îro gereke, karbidestên saziyên çap û weşanên herêmê xwe ji vê diyardeya nerênî rizgar bikin. Bila licnên taybetmendiyên sengandina pirtûkên nivîserên me bihêne destnîşankirin û bi çavekê mijarane û bi wijdan û dûrî havliyên niyasînî û biraderînî, bila pirtûk ji çapkirin û weşandinê re were polînkirin.

Çavê erşîvê wan saziyên çapkirinê ji reşnivîsînên nivîseran valabûn. Hîngê dibe diyardeyek normal be, hinek pirtûkên giring dubare werin çapkirin.